

Şîroveyên ji bo dê û bavên zarokan yê kû pirzimanî mezin dibin

Hemû ziman bi qasî hevûdû hêja ne, ji ber ku li pişta wan de çand hene.

Ji ber vê yekê, divê ji hemû zimanan re rêz were girtin.

Ji bo kû zarok zimanê xwe bi serfirazî fêr bibe, girînge kû

- ▶ Bi zarokê/a re têkiliyek we ya baş/bi zarokê/a re eleqeya we ya rastîn, hebe.
- ▶ Hûn modelekê zimanî ya baş bin (kîjan zimanê/zimanên kû hûn çêtir diaxifin, bi vê biaxifin).
- ▶ Hûn pir biaxifin (ji bo zarokê/a xwe pêşniyarên gelek û cûdahî yê zimanê yê cihêreng bikêr bikin). Ji her tiştî çêtirîn: lîstin, xwendina bi dengekî bilind, vegotina çîrokan, stran-an, zûgotin, lîstikên kû tî guhdarî kirin, derketina derve, serdana kesên din.
- ▶ Wê/wî fêr nekin, tenê di derbasbûnê de rast dubare bikin.

Girînge kû mirov ji bo fêrbûna zimanên din bizanibe kû,

- ▶ Pêwîste kû zimanê yekem pir baş were fêr bûyîn (domdarî bi qasî 5 salan)
- ▶ Fêrbûna çend zimanan di heman demê de, pêkan e.
- ▶ Tişteke wekî rêbaza bêtêmasî tune ye.
- ▶ Fêrbûna yek zimanekê duyemîn bi teşwîqekê baş û gelek pratîk bi qasî 3 salan didome.
- ▶ Divê hûn ne li bende bin kû zarokê/a we bêtêmasî duzimanî- an ji pirzimanî be.
- ▶ Yek tevlihevkirina zimanan normal e, her weha tevlihev kirina mê û nêr, artîkel û ava kirina hevokan.
- ▶ Divê nivîsandin jî bi kêrahî were fêr bûyîn (wek mînak bi alîkarîya HSU),
https://www.dortmund.de/de/leben_in_dortmund/bildungswissenschaft/schule/herkunftssprachlicher_unterricht/index.html)

- ▶ Pêdivî ye kû hûn bi rexneyî li medyayê mêze bikin (heya 3 salan TV , têlefona desta, PC tune; modela rola zimanê zindî pir çêtir e, lîstikên kû tèn guhdarî kirin, baş in)

Ferî zarokê/a xwe bikin kû elmanî bi qasî zimanê zikmakî û malbatî girîng e.

Feydeyên pirzimanîyê pir caran ew in:

- ▶ behreyên sosyo-hestyarî yên bilind (bi tiştên din va bi hevra dilovanî jî tê de)
- ▶ rêveberiya çêtir ya pevçûnê
- ▶ yek kapasîteya mezintir ya bîrê
- ▶ yek bala baştir kirin
- ▶ yek hêsantir hînbûna zimanên din
- ▶ ezmûnên çandî yên mezintir
- ▶ bêtir mecalên dîtina hevkarên sohbetê
- ▶ derfetên mezintir yê karê

„Tu bi çend zimanan
biaxî, tu ew
qas însan î.“

(Johann Wolfgang Goethe,
helbestvanê Alman)